

JI ÇEND XALAN VE PIRSGIRÊKÊN WERGERÊ

DOSYA: SALIHÊ KEVIRBIR

Wêje yan Berdewamiya Asîmlasyonê?

Di êvareke Adara 2005 de, Sedat Yurtaş, şifêree tirmpêla em tê de û ez ji Selahedînê ber bi Hewlêrê ve diçûn. Di wan fetlanokên rê de, ez li fetlanokên rêya Mêrdîn û Nisêbînê û rêwitiyên xwe yên salên dibîstana navçeyî yên di Newala Qutê re dihizirîm.

Bêhna biharê ya ku di şibakeyên tirimpêlê re dihat jî, biharên zarokatiya min dianî bîra min. Lê ew hestên li ser erda azad, xweşiyên taybet bûn.

Di wê rewşê de gotin hat ser wêjeyê û Sedat behs kir, jê re teklîfek hatiye ku ew çîrokên li ber destê xwe mîna pirtûkeke duzimanî biweşîne. Hîngê ez ji Newala Qutê vegeyriyam û min ji Sedat re got ku weşadina nivîskarên tirk tev li wergera wan ya kurdî weşandin: Leyla Erbil (Ejdehayê Sêserî), Oya Baydar (Mirina Li Madrîdê), Muge İplikçi (Gelaciyên Bajarê Nû), Sema Kaygusuz (Efsirî), Jaklin Çelik (Jiyanê Li Îstasyonê Dest Pê Kir). Ka bi çi hizrê ev pirtûk hatin weşandin, ev proje bi alîkariya kê pêk hatiye, ez nizamim. Çapemeniya kurdan mîna gelek bûyerên din, ji dêvla ku me li ser vê bûyerê agehdar bike, ew jî wek projeyê gelek giring pêşkêşî raya giştî kir. Rexnegirê tirk Semih Gumuş, ew mîna „hewldaneke mezin ya çandî û wêjeyî“ bi nav kir.

Bêguman wergerandina berhemeke wêjeyî xebateke pîroze. Lê belê, ka çawa wergera ji kurdî bo tirkî tenê pêkanîna asîmlasyonêye, dê belavkirina van pênc berhemên jî tev li Tirkiya wan heman encamê pêk bihîne. Di rewşan de berhemên duzimanî dikarin xizmeteke baş bikin. Heger li welatekî ku zimanek ji wan her du zimanan ne di bin gifa yê din de be, ji bo derzê berhemên wisa bihên belavkirin, dê karekî baş be. Li Tirkiyeyê hîn jî kurdî di bin gefa tunekirinê de ye. Û ev gef ji ezmanan bi zenbîlan nabare; ew bi zanebûn bi rêya zimanekî kujer dihête pêkanîn. Ku rewş ev be, belavkirina berhemên wêjeya

tirkî tev li wergera wan ya kurdî, dê hêsankirina belavkirina asîmlasyonê û pê re jî lawazkirina kurdî bi xwe re bihîne. Ev bûyer, xetera li ser zimanê kurdî vedişêre, wî zimanê ku zarokên kurdan li dibîstanan bi fişarê fêr dibin, bi kurdan şîrîn dike.

Dibe ku ji nezanî, dibe ku ji niyeteke paqij jî ev kar dihêne kirin. Mirov rabe di pirtûkên wêjeyî de kurdî û tirkî bi hev re, di hembêza hev de bixe xew û biweşîne, dihê wê wateyê ku me hîn jî pêwîstî bi gopalekî heye, gopalê zimanê tirkî. Divê ew wergêr û nivîskarên ku bê rawestan berhemên kurdî dikin tirkî û yên ku dixwazin berhemên tirkî bi rêya pirtûkên duzimanî li nav kurdan belav bikin, bizanibin ku encama her du kirinan ya bingehîn eve: Asîmilasyon!..

Husên Düzen

Wergêr/Almanya

Ji wergerê re hewcedariya pirtûk û ferhengên heye

Zimanê kurdî zimanekî qedîme, hem di warê bêjeyên hev wate de zêdeye û hem jî ji gelek zimanan zêdetir navê pir tiştan (objeyan) di ferhengê xwe de dihewîne. Lê sed mixabin dîsa jî dema ku mirov bi hin zimanên xwedî dewlet ve berawirdiyê bike, dibîne ku ev ziman, bi pêş neketiye, bi gotineke din zêde ne praktîke. Li gorî dîtina min, di vî warî de sedema herî mezin ji hêla nivîsîn û xwendinê ve paşvemaşîne. Û ev pirsgerêk ne tiştêkî nû ye. Ji xwe dema ku mirov li paşerojê bizivire û li dîrokê binêhêre dibîne ku bav û kalên kurdan (Împeratoriya Med) li gel ku ji berî zayînê sala 539-ê pê ve kêm-zêde 300 salan, hema hema li ser tevahiya cîhanê desthilatdar bûne jî, derbarê dîroka kurdan de çî berhemeke nivîskî li paş xwe nehiştine. Ji bo vê yekê ye ku îro jî hêla hin dewletên desthilatdar ve dîrok, ziman, çand heta wekî gel hebûna kurdan hatiye înkarkirin. Lê dîroka ku bi nivîskî nehatiye ragehandin pir mixabin îro jî hêla cîhanê ve wekî derbasdar nayê pejirandin anku bi her awayî rola xwendin û nivîsê pir girînge.

Ez bi xwe demeke dirêje ku ji zimanê germanî û tirkî pirtûk û nivîsaran li zimanê kurdî werdigêrinim. Li gorî dîtina min dema ku



mirov bixwaze berhemekî wergerîne, bêguman divê pêşî di derbarê qelîte û pîrozbahiya wê de lêkolînê bike. Ji ber ku heta pêkan be çi wergêr, naxweze berhemekî ku nenavdare û ji hêla mirovan ve zêde neyê xwendin yan di naveroka xwe de agehiyên bi nirx nehûndirîne, wergerîne. Ji hêla din ve jî divê wergêr pîrozbahiya berhema ku werdigerîne bipejirîne û ji dil wergerîne. Yan na di warê kuwalîteyê de çi caran nikare bigehê armanca xwe. Ji wergerên min yek jî Pirtûka Pîroz (Zebûr û Încîl) e ku min ji wergera bi nav û deng ya zimanê germanî 'Neue-Welt-Übersetzung der Heiligen Schrift û Tirkî Kutsal Metinler İncil' ê wergerandiye û ji weşanê re dihê amade kirin.

Pirtûka Pîroz cara pêşî bi zimanê îbranî, aramî û grekî hatiye nivîsîn wekî ku dihê zanîn di cîhanê de pirtûka herî kevne. Heta niha yan bi tevahî, yan jî hin nivîsarên wê kê-m-zêde li 2.300 zimanan hatiye wergerandin û bi milyaran hatiye çapkirin. Lewre ji bo min wergerandina Pirtûka Pîroz ya li zimanê kurdî, kar û şerefeke pir mezine. Di wergera Pirtûka Pîroz de divê hem bêje bi heman wateyê bihên wergerandin û hem jî heta ku derfet hebe hevok li gorî zimanê bingehîn (resen) bi heman şeweyî bihêne çêkirin. Loma bi taybetî jî di pêvejoya wergera Pirtûka Pîroz de heta niha gelek dijwarî û arîşe derketin pêşberî min. Astenga herî sereke di zimanê kurdî de tunebûna pirtûkeke ku mirov ji bo wergerê alîkariyê jê bistîne bû.

Mesela li gel ku bi 'kurdî tirkî-tirkî kurdî' ferhengek pir qenc ya ku ji aliyê birêz Zana Ferqînî ve hatiye amade kirin û ji hêla Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hatiye derxistin di dest min de heye jî, gava ku ez ji zimanê tirkî werdigerînim, ji bo di hevokê de bikaranîna bêjeyan rastî gelek arîşeyan dihêm. Ji ber ku di zimanê kurdî de ferhengeke wekî ansiklopedî yan pirtûkeke ku bi taybetî ji bo vî karî hatibe amadekirin, pir mixabin hê tuneye. Ne jî pirtûkeke ku bêjeyên pirwate şîrove dike û şeweyê bikaranîna wan ya di hevokê de, di nava xwe de dihevwîne heye.

Her çend ferhengeke bêjeyan ya „germanî-kurdî“ tune jî, dîsa dema ku ez ji zimanê germanî werdigerînim, ji pirtûkên germanî yên wekî: 'Duden', 'Synonymwörterbuch', 'Herkunftswörterbuch', 'Fremdwörterbuch' û hwd. ên ku bi taybetî ji bo vê armancê anku ji bo wergêran ji hêla zimanzanan ve hatine amadekirin gelek alîkariyê distînim. Ev pirtûk hem wateya bêjeyan bi awayeke berfireh şîrove dikin û hem jî bêje di hevokê de çawa dihên bikaranîn bi zelalî nîşan didin. Ji aliyê din ve jî, ji bo ku zimanê kurdî zimanekî indogermanisch e, di warê nêr, mê, çêkirina hevokan, gramer û hwd.

de gelekî dişibe zimanê germanî. Ez di vir de dixwazim bihînim ziman ku bi taybetî jî ji bo karên wergerê hewcedariya wergêrên kurd bi gelek pirtûk û ferhengên wisa neye.

Ayhanê Bêrtî
Wergêr/Almanya



WERGER

DESTPÊK

Wergerandin guherandina zimanê peyamêye bêyî ku naveroka peyamê bi xwe biguhere. Di wateya xwe ya berfireh de wergerandin dikare guherandina her mesaja bi zimanekî li zimanek din be, lê bi wateya teng ew dihê maneya jinûvenivîsîna peyamek nivîskî bi zimaneke din. Di wateya teng de hingê ji guherandina peyamên devkî re paçvekirin anku tercumekirin dihê gotin.

Di wergerandinê de du ziman hene: 1) *zimanê jêder* anku zimanê ku teksta orijînal pê hatiye nivîsîn, û 2) *zimanê wergir* anku zimanê ku peyama ku bi zimanê jêder hatiye nivîsîn bi wergerandinê bi zimanê wergir dihê ragehandin. Ji teksta ku jê dihê wergerandin re *teksta orijînal* û ya ku wek encama wergerandinê peyda dibe jî *wergêr* dihê gotin. Kesa/ê ku karê wergerandinê jî dike *wergêr* e.

DÎROKA WERGERÊ

Vekoler hevbirin ku hê di serdemên pêşdîrokî de wergerandina devkî anku paçvekirin di navbera hoz û êlên cuda de hebû. Hingê jî paçvan anku terciman di gelek ji wan karan de alîkar bûn yên ku niha jî pê mijûlin: bi taybetî di danûstandinên silh û aştîyê û di bazirganiyê de. Yekem gotina li ser tercumekirinê ya vedîtî ji Misrê ye û nêzî 5 000 salan kevne. Kevntirîn behsa wergerandina nivîskî jî ji Împaratoriya Kevnar ya Misrê ye û ew jî ji nêzî 4 000 salan berî nihaye. Li Mezopotamyayê wergerandin nêzî 1900-ê BZ dest pê kir dema ku dastana Gilgamêş ji sûmerî li akadî hat wergerandin. Di serdema Skenderê Mezin de gelek berhem ji misriya kevn li yewnanî hatin wergerandin. Cihûyan jî hê berî hatina Hz. Îsa dest bi 33

wergerandina Pîroznameyê (Pirtûka Miqedes, Bîbel) kir û paşî heta roja îro jî ev pirtûk bû wergerandîtirîn pirtûka dinyayê. Her wiha wêjeya latînî bi her awayî bi wergerandina ji zimanê yewnanî hat xurtkirin. Fîlozofê navdar Cicero ku bi xwe pir werdigerand pirtûkek jî li ser metodên wergerandinê nivîsiye. Giringtirîn peyama wî ewe ku divê peyama *ne peyv bi peyv* bihête wergerandin, lê naveroka peyama orijînal bi rêbazên zimanê wergir bihên ragehandin.

Ji sedsala 9-ê ve misilman di wergerandina berhemên senskrîtî û yewnanî li erebî de gelek çalak bûn. Berhemên hin fîlozofên giring yên yewnanî tenê di wergerên erebî de mane anku tekstên orijînal yên yewnanî wenda bûne.

Li serdema nû li Ewropayê bingeha nivîskî yê gelek zimanên neteweyî bi xêra wergerandina Pîroznameyê hat avakirin. Nûjenkarê dînî, Martin Lutherê alman, hemû Pîrozname li zimanê xwe wergerand û di sala 1534-ê de weşand. Luther hê jî yek ji mezintirîn wergêrên hemû serdeman dihê pejirandin. Her wiha Pîrozname jî bi taybetî bi îlhama wî bûye destpêka dîroka zimanê nivîskî yê gelek gelên din jî. Ji ber ku misyonerên xwestiyê ku wê peyama pîroz bi her milletî, bi zimanê wî bidin xwendin. Hê li sedsala 19-ê hin ji wê li kurmançî (bi alfabe ya ermenî) jî hatiye wergerandin. Mixabin wergerandina Quranê di nav misilmanan de çî caran roleke wiha giring nerabûye.

WERGERANDIN LI KURDÎ

Yekem berhema berfireh ya ku em jê haydarin ku li kurdî hatiye wergerandin *Şerefnameya Şerefyanê Bedlîsî* ye ku Mela Mehmûdê Beyazidî li salên 1858 û 1859-ê kiriye kurmançî. Wekî din wergerandina bi berfirehî li zimanê kurdî tiştek nû ye. Tenê kitûmat nivîsên kurt berî salên 1980-î û 1990-î ji zimanên din wergerîne kurmançî. Salên 1990-î mirov dikare bi awayekî wek ronansa wergerandina kurmançî bibîne. Ev tevger bi taybetî li Swêdê xurt bû lê niha gihiştiye Bakurê Kurdistanê û li devera kurmançîaxiv ya Başûrê Kurdistanê (Behdînan) jî belav bûye. Her wiha înternetê jî delîvên nû li ber belavkirina wergerên li kurmançî vekir. Wergerandina li soranî bi taybetî li salên 1960-î û 1970-î dest pê kir û hê jî berdewame. Her wiha vê dawiyê hewldanên wergerandina li zazakî jî hene.

Lê dîsa jî wergerandina li kurdî dûrî profesyonelî û sistematîkiyêye. Çend camêr û kitûmat xanim di wergerandina li

kurmancî de jêhatîne lê kes ji wan jî ne têr mijûlî wergerandinêye. Wergerandin ji wan re tenê hobiyeke û tenê dema ku betal bin berheman werdigerînin. Li hêla din çî piştevaniyeke berbiçav ji wergerandinê re jî nîne. Çî dezgehên xurtkirina wergerandinê, yan hema weşandina wergeran jî ji xwe re nekiriye bar. Xwendevanên wergerên kurmancî hema bêje nînin. Di heman demê de hin "ronakbîr" û "nivîskarên" me jî wergerandinê bêbiha dihesibînin. Min ne tenê carekê û du caran ji devê wan bîstiye ku wergêrên kurd ewin yên ku bi xwe nizanin çî tiştî biafirînin lê radibin hem berhemên orijînal û hem jî zimanê kurdî bi wergerandinê diherimînin!..

Hussein Muhammed
Wergêr/Finlandiya



EZ Û WERGERANDÎN

Min di 15-saliya xwe de yekem car dest bi wergerandinê kir dema ku min ferhengokek peyvên zimanê fînî (fînlandî) li kurdî (kurmanciya bi alfabeya erebî) wergerand û ew listeya 2000-peyvî ji alî pirtûkxaneya bajarê min yên hingê (Kemi) hat weşandin. Hingê sala 1995 bû. Di sala 1997-an de min yekem novel ji zimanê fînî wergerand û paşî di kovara Nûdemê de belav bû. Piştî wê 6 pirtûkên min wergerandî çap bûne û çendîn antolojiyên helbest û çîrokan li ser înternetê di Kovara Mehname de derketine. Niha jî bi dehan berhemên wergerandî lê hê belavnekirî di dest min de hene. Yek ji projeyên min yên herî mezin jî amadekirina ferhengeke soranîkurmancî ye ku nêzî nîvê wê amadeye. Ji sala 2002-ê ve di ber xwendina xwe ya dadnasiyê (hiqûqê) re bo Wezaretê Hûndirîn ya Fînlandiyê wek wergêr xebitîme. Min her wiha salên 2004-2006 di ber dadnasiyê re li zankoyê wergerandina fînî-îngilîzî jî xwendiyê. Piştî ku 200-ê min dest bi karê parêzeriyê kir, êdî min tercimanî nekiriye lê hê jî carine angaştnameyên (îdianameyên) dozgeran û biryarnameyên dadgehan werdigerînim kurmancî yan soranî.

Vê dawiyê min pîrraniya dema xwe ya derî karê parêzeriyê daye amadekirina ferhengek kurdî-kurdî-biyani

(<http://ku.wiktionary.org>) lê dîsan jî bi taybetî helbestan

werdigerînim.

Li vir dixwazim bi kurtî metodên xwe yên wergerandinê raberî xwendevanên delal bikim. Mebesta min ne ewe ku bibêjim ev tek metodên rastin lê wan pêşkêş dikim, hem bi hêviya ku xwendevan ji wan sûdê wergirin û hem jî heger kêmasî tê de hebin, bila ji qenciya xwe min agehdar bikin. Van metoda bi taybetî bo wergerandina berhemên wêjeyî bi kar dihînim lê gelek ji wan bo wergerandinên din jî guncavin:

1) Cara pêşî teksta orijînal dixwînim da ku peyama wê têbigehim. Heger peyama wê bi dilê min be, pêş dikevim xala duyem:

2) Lê dipûnijim ka gelo wergerandina vê berhemê ji bo zimanê kurdî giringe. Bo nimûne heger peyam pir giring be, yan bi taybetî kurdan eleqedar bike, yan jî di nav kurdan de ta niha behsa tiştek wiha yan bi vî awayî nehatibe kirin, ew peyam hêjayî wergerandinêye. Her wiha heger peyam bi şeweyeke delal hatibe hûnandin û spehîtiya wê zimanê kurdî li ber xwendevanan şirîn bike, ez wergerandina wê giring dibînim.

2) Diramim ka hêz û taqeta min dê bo wergerandina wê hebe. Heger tekst gelek dijwar be, belkî nikarim wê wergerînim. Carine wê tekstê bo siberojê dihêlim û têdikoşim tekstek ji heman biyavê (mijarê) lê asantir wergerînim.

4) Difikirim ka gelo ew tekst dê min bi wergerandinê biperesîne, anku pêş bixe. Heger ne ji neçarî be, naxwazim tekstên ku di wergerandina wan de hînî çî tiştek nû ji wergerê nebim werbigerînim!

5) Gelo dema min bo wergerandina vê berhemê heye?

6) Heger ta vir bersiv "belê" be, carek din jî tekstê dixwînim. Di ber re lê dihizirim ka filan peyvê çawan li kurdî wergerînim.

7) Piştî ku naveroka peyamê ji min re zelal dibe û dizanim ka her peyvê çawan wergerînim, dest bi wergerandina xav dikim.

8) Piştî wergerandina her paragrafê, wergera wê çend caran dixwînim da ku bizanim ka çî kêmasî tê de hene û ka gelo zelale.

9) Piştî qedandina hemû wergerê, wê çend rojan dihêlim û "ji bîr dikim". Paşî lê vedigerim û bêyî ku teksta orijînal bibînim wergerê dixwînim. Heger zimanê wergerê kurdiyeyeke bi qasî gengaz bêşaşî û kêmasî be, herikbar bihête xwendin û peyama wê zelal be, hingê dikarim biçim xala 10-em:

10) Wergerê ji daxwazkera/ê wê re yan jî bo weşandinê dişînim û li hêviya pêşniyar û rexneyan dimînim.

PEND BOWERGÊRA/Ê DESTPÊKER

- 1) Yê ku şaşîyan neke çî tiştêk dî jî nake. Netirse ku dê şaşîyan bikî. Çi kes ji me bêkêmasî nîne. Heger li bendê bî ku bibî wergêrekî kamil û paşî dest bi wergerandinê bikî, dê bêmîrad bimirî!
- 2) Rahênan dike palewan. Kes ji me wergêr ji zikê makê derneketiye. Tenê bi wergerandinê dikarî fêrî wergerandinê bibî.
- 3) Barek sivik rake. Gelek kes bi berhemên nemir yên cîhanê wek Qur'anê yan Shakespeare yan Şerefnameyê dest bi wergerandinê dikin. Bi ihtimalek mezin ew dê bi ser nekevin. Pêşî bi berhemên asan û kurt dest pê bike. Paşî klasîkên cîhanî jî dê li ber te hêsan bin.
- 4) Wergerandin, ji afirandinê ne kêmnirxtire, lê ihtimale ku diwartir be. Di afirandinê de bese ku asta xwe ya zimanzaniyê bi kar bihînin. Lê di wergerandinê de neçarî asoya zimanzaniya xwe li gor ramanên nivîskarek din berfireh bikî. Bi vî awayî zorê didî xwe û didî zimanê xwe jî ku biçê seredana hin der û deverên ku jê re nenasin. Wiha hem xwe û hem jî zimanê xwe pêş dixî.
- 5) Dilsozî peyama nivîsa orijînal be. Lê ne hewceye ku koleyane her peyv û benda rêzimanî li gor zimanê biyanî bi kar bihînin.
- 6) Wergêr divê orijînal bixwiye. Divê wergêr bi xwe serbixwe be anku bêyî ku xwendevan teksta orijînal bibîne, hemû peyama wê bi rêya wergêrê werbigire.
- 7) Pir wergêrîne, lê li wergêrên xwe hişyar be. Dikarî tenê bi wergerandina bi salan baş hînin wergerandinê bibî. Lê he jî îro ve dest pê bike! Lê hişyar be ku peyama teksta orijînal neguherînin yan winda nekî, yan jî dê baweriya bi wergerandina te êdî nemîne.
- 8) Xwe li tekstên cûr bi cûr biceribîne. Ferhengan dikarî bi kar bihînin, lê her tiştê ku tu tê de xetimî bi alîkariya ferhengan çareser neke. Lê bîponije ka çawan dikarî wê bi awayeke din bibêjî bêyî ku peyam bi xwe biguhere.
- 9) Wergêra xwe çend caran bixwîne. Bi kêmî du caran bixwîne da ku bizanî ka peyam rast hatiye ragehandin. Bi kêmî du carên din jî bixwîne da ku jê piştrast bibî ku zimanê wergêrê têgihbar û herikbare. Wergêra xwe piştî amadebûnê demekê hilgire. Paşî, carek du caran bixwîne û hingê bide weşandin.
- 10) Li pêşniyarên xwendevanan vekirî be. Bila rexneyên tûj jî te netirsînin.